



Çandî ya Dumehane ye

Hejmar 4 Adar-Nisan 2017





Sernivîskarê beşê Kurdî:

Xoşman Qado

Sernivîskarê beşê Erebi:

Ciwan Teter

Rûpelsaz: **DIVMON**

www.divmon.com

Tabloya Bergê Beşê Kurdî:

Behrem Haco

Tabloya Bergê Erebi:

Selaheddîn Demîrtaş

Re.magazine2016@gmail.com

fb.com/Rê

remagazine.site123.me

===== Naverok =====

-Gotina RÊyê

**WERGERANDIN PIRA HEVNASKIRINÊ Û XEMLA
ZIMANÊ DAYÎKÊ YE**

-Hevpeyvîn

LI GEL HELBESTVAN ŞÊXMÛS SEFER

-Hişam Eslan

WÊJE Û SÎNEMA...DESTPÊK Û DAWÎYA DÎLANÊ

- J. Thomas Rimer and Van C. Gessel

ANTOLOJÎYA WÊJEYA JAPONÎ YA NÛJEN

- Ebas Mûsa

**BERF, Dema Japonyaya Spî Kirasê Romansa Fransayê
Li Bejna Xwe Dialîne**

- Xalid Sulêman Elnasirî

BERGÊN PIRTÛKAN Û HEZKIRIN

- Çîmen Adil

Wêne- Himbêza te

- Hekîm Ehmed

VALA NEBÛM

-Buşra Hamid

PENABERÎYA BÊDAWÎ

-Arya Hacî

ÇAVÊN VEMIRÎ

-Kewa Gozel

WERGERANDIN PIRA HEVNASKIRINÊ Û XEMLA ZIMANÊ DAYÎKÊ YE

Têgiha wergerandinê wê çarçoveya teng a ku tenê mîna xebatek bo ziman e derbas dike, çî ku ew bi xwe pêwîstîyek bo pêwendîdanînê ye berî ku bibe emrazek bo veguheastina kelepûr û serbihurîyên çandên dîtir. Ji lew re roleke girîng a wergerandinê di pêwendîdanînê de û çesipandina çandê di navbera gelan de dilêze, her wisa şaristanîyê dewlemend dike û nasnameyê jî teqez û xurt dike.


Ji ber ku wergerandin hewil dide tenhatîyê bişkîne, û di rêya wê re pirine çandî di nav zimanan de peyda bibe, armanca wê jî ew bû ku bibe dergehek bo naskirina wêje û çand û şaristanîya her gelekî, her wisa sûdê ji ezmûn û afrînertîya hev din werbigrin. Ziman jî zindîwerek e ku ew jî hertim di rêya pêşketin û geşbûn de ye. Gellek emraz alîkar in di hebûn û geşbûna zimanên jîndar de, her wisa pêdivîya kesên ku zimanekî bikar tînin pêk tîne, yek ji wan emrazan wergerandin e, ji ber ku ew jî dibe pirek di nav kesên jihev cuda di warê ziman û çandê de, çî ku pêwendîya di navbera du zimanan de helbet dê bandora herduyan li ser hev hebe.

Tê nasîn ku hêzên dagirker tim pergala xwe li ser bingehekê ava dikir ew jî çesipandina çanda xwe û tunekirina çanda gelên bindest e, ji ber bi qirkirina çand û zimanê gelên bindest hêzên dagirker hebûna xwe ava dike. Zimanê kurdî yek ji wan zimanên ku li rastî hewildanên bişaftin û tunekirinê hat, û hêzên ku

Kurdistan dagirker kirine bi hemû şîyanên xwe xwestin ziman û çanda gelê kurd winda bikin, çî ku nasnameya her gelekî zimanê wî ye. Ji ber vê yekê jî îro roj ji hemû hezkirîyên zimanê kurdî tê xwestin ku zimanê xwe biparêzin û ked û xebateke bêhempa bo vî zimanî bikin, ji lew re ji nivîskarên kurd ên ku bi zimanê kurdî dinivîsin tê xwestin ku bi berfirehî berê xwe bidin wergerê da ku him girîngîya zimanê xwe nas bikin û him jî vî zimanê bêxwedî dewlemend û geş bikin. Kovara RÊyê jî dê tim guhdaneke mezin bide warê wegerê da ku ew jî beşdar be di pêgava geşkirina zimanê kurdî de.

| Sernivîskarê Beşê Kurdî

HEVPEYVÎN LI GEL HELBESTVAN ŞÊXMÛS SEFER



Helbestvan û nivîskar Şêxmûs Sefer di 1977an deli Mêrdînê ji dayîk bûye, di sala 2012an de bû serokê Komeleya Nivîskarên Kurd a Amedê, û di sala 2013an de di encama kongira 8an a Pena Kurd de li Amedê, hate hilbijartin bo serokatîya Pena Kurd.

Di sala 2006an de ji weşanxaneyê Lîsê bi navê “Bîstan Hatîna Berdan” û di sala 2011an de ji weşanxaneyê Ronahîyê bi navê “Piştî Xezal Terqîyan” ev her du berhemên helbestî hatin çapkirin, her wiha di gel wan karan tevan de rojnamegerîyê jî dike, û gellek bernameyên wêjeyî û hunerî di TV yê kurdî de amade û pêşkêş kirine, û di rojname û malperên Kurdî de bi awayekî berdewam nivîs û gotarên wî belav dibin.

-Ezmûna nivîsandina bi zimanê dayîkê bo te tê çî wateyê, nexasim ku zimanê Tirkî bi berferhî cih di mejîyê kurdên Bakurê Kurdistanê de girt, jixwe rêjîmên desthiladar ên ku dagerkerîya Kurdistanê kirine bi hemû şîyanên xwe xwestin ziman û çanda kurdî tune bikin, ji ber wê jî zimanê kurdî ma dîlê malan tenê.

Ev qonaxek tevlih e. Pêşî tu bi zimanekî mezin dibî, ew kêlî di rastîya xwe de bingeha jîyana te saz dike, yanî temenê te yê mayî hemû li ser wê zarokatîyê derbas dibe, eger qelen avahîyek be, ew kêlî û ew dem dibe bingeha wê avahîyê. Îcar ji ber wê ji bo hemû Kurdan pêşî bingehek xurt ava dibe û paş re ev bingehek (zimanê dayîkê) rastî tîr û topên Tirk û Ereb û Farisan tên. Îcar di vir de tiştê girîng ew e ku tu xwe ji van êrîşan çî qas dikarî biparêzî. Ji ber wê ye nivîskarek navdar ê Kurd dibêje “pîvana neteweperwerîyê ziman e”. Ji boyî min ev nerîn pirr di cih de ye. Ji ber wê jî ez tu wateyê nadim ew kesên ku ji bo Kurdan têdikoşin û zimanê Kurdan nizanin, naxwazim ew Kurd be!

Bi taybet ev mijar ji boyî min xwedî hestyarîeyeke cuda ye. A rast ew e ku ya min jî wekî ya her zarokekî Kurd e. Belkî Bavê min di heftsaliya min de min bir dibistaneke leylî û ji min re got tu here polê ez li vir bende te me. Ez piştî li ber mamostayekî Tirk ku min tiştek jê fêm nedikir ji polê derketim û bazdam çûm cem bavê xwe, min nerî ne li bexçeyê ye û ji wê rojê pê de ez lal bûm(!)

Min ji zimanê xwe hez kir. Jê nexeyidîm, hêwir bû ji bo min. Ew germahîya ku zimanê min dida min tu carî zimanê Tirkî neda min. Berî her tiştî cihê zaroktîya min bû kurdî, berîyeke dûr û dirêj bû, çîyayên bilind, zinarên bedew bû.

Eger min binivîsanda nedibû bi zimanekî din binivîsim. Eger min helbest binivîsanda wekî Ebdula Peşew gotîye; ma dibe ku bi zimanekî din binivîsim eger kurdî hebe!

Min bi xwe di destpêka salên 90î de li Stenbolê dest bi nivîsandina Kurdî kir.

-Helbest cihêkî pirr mezin di wêjeya kurdî de girtîye, sedema vê yekê çî ye di nerîne te de, û çima celebên din ê wejeyê bê guhdan in?

Çend sedemên wê hene, yek jê her kes difikire ku helbest celebê pirr hêsan e û dikare helbestê binivîse. Ev hinekî bi hestên

merivan jî girêdayî ye, hest û helbest, lê tiştê girîng ew e ku tu çawa dinivîsî, ne ku tu çi dinivîsî. Her kes hîs dike, her kes di jîyana xwe de ji tiştêkî hez dike, hest jî kêr zêde wekî hev in. Lê bi hezaran kes helbestan dinivîsin, çend kes di bîra me de dimîne wekî helbestvan, an jî wê çend kes bimînin wekî helbestvan.

Ya din jî helbest di kurdî de her hebûye, celebên din paş re cih girtin. Ev hinekî bi qonaxa jîyana meriv jî girêdayî ye. Bi bajarvanîyê hin celebên wêjeyê derketin pêş û bajarvanîya Kurdan jî hinekî nû ye.

-Îroj helbesta kurdî gihaştîye kîjan astê, heger em bi nerîneke rexneyî lê binerin –çi ku tevgera rexneya wêjeyî pirr lawaz e- em dikarin çi ji bo miletên dîtir re bibêjin û çawa helbesta kurdî ji wan re pênasê bikin?

Helbesta Kurdî ji roja roj de heta aniha di asteke pirr baş de bû yî, lê mixabin wekî Ehmedê Xanî gotîye bazara wê tune (bû) ye. Bi ya min em di rexneyê de zêde neheqîyê li xwe dikin. Di dema Ehmedê Xanî de jî (bi giştî helbesta kilasîk) helbesta Kurdî baş nehat zanîn û aniha di ya modern de jî. Gellek kurdnasên biyan Ehmedê Xanî di asta herî bilind a cihanê de dîtine lê me wî zêde nas nekiriye.

Îroj mixabin bo helbesta nûjen jî em dikarin vê bejin. Ji helbestvanên soran heta yê kurmanc dewlemendîyeke ecêb û helbesteke pirr xurt heye.

-Gelo em dikarin bêjin ku du qonaxên helbestnivîsa kurdî heye, qonaxa kilasîk û ya pexşan, û ev her du qonax girêdayî hiş û çanda kurdî bû yan kete bin bandora hiş û çandine din de?

Qonaxa helbesta Kurdî bêguman hebûye, wekî gellek wêjeyên din ê cihanê. Qonaxa kilasîk bêhtir Kurdî û xwerû bûye her çi qas peyvên biyan zêdetir tê de hebûye jî, ruheke kurdî û sosyolojîya kurdî di helbesta kilasîk de xwe dida xuyakirin. Lê bi helbesta nûjen ev yek zêde xuya nake. Şêwe û celebên nivîsandinê

guherîn, dinya guherî û Kurdî jî divê xwe adapteyî vê guherînê bike.

-Dengbêjîya kurdî ji hunerên tewrî zengîn in, û tê nasîn ku ew stonê helbesta kurdî ye, ta çi radeyê sûd ji vê hunerê hate wergirtin, û helbestvanê kurd dikarîbû vê celebê bike nimûneya helbestek resen bo gelê kurd?

Dengbêjîya kurdî bingeha gellek hunerên kurdî ye. Ev yek ji bo helbesta kurdî jî derbasdar e. Dengbêjî hinekî vegotîneke helbestîye jî di koka xwe de. Li dinyayê kê mînakên wê hene lê mixabin ev jî hêdî hêdî wekî gellek tiştên me ji dest me diçin. Helbestvanê kurd li gorî min nikare formeke nû bide dengbêjîyê, tenê dikare jê sûdê werbigire.

-Tu di warê ragihandinê de jî kar dikî, li gorî kar û xebatên te û şopandina te ji ragihandina kurdî re, gelo em dikarin bibêjin ku kurd xwedî ragihandin in li himberî ragihandina ku li dijî wan kar dike. Û li alîyekî din ragihandina kurdî dikarîbû bi erkê xwe yê neteweyî di vê qonaxa girîng de rabe?

Ragihandinek heye lê mixabin em nikarin bêjin sedî sed ragihandinek azad e û di bercewendîya gelê xwe de ye. Dîsa mixabin her rêxistinekê li gorî îdeolojîya xwe, nerîna xwe û feraseta xwe ragihandineke dîtbarî û nivîskî ava kiriye. Û hema hema hemû kesên cuda difikirin di televîzyon an rojnameyên xwe de dernaxe. Ev yek jî bi demê re gellek probleman çêdike. Bawerî kê mî dibê û temaşevan û şopdarên wî tiştî dibin wekî kesên alîgir ên tîma futbolê.

Ev ne bes e di van salên dawî de jî hin ragihandin peyda bûn ku bi giştî li dijî bercewendîya Kurda ne û bêthir jî li gorî siyaset û bercewendîyên desthilatdaran tevdigerin. Lê hûn bala xwe bidin ragihandina desthilatdaran, çi dema ku bercewendîya neteweya wan, dewleta wan were holê hemû dibin yek û nabe ku tu tişteki cuda ji wan bibihîzî yan bibinî.

Ez nabêjim ev yek jî tişteke pirr baş e bo ragihandineke azad û serbixwe lê qet nabe heta Kurd bigihêjin mafên xwe yên netew-

eyî divê wisa tevbigerin. Wekî din rêyek din tune. Wekî din tune.

Em baş dizanin ku hêza herî mezin yek jê ragihandin e, lê divê ev ne di bercewendîyên kes û rêxistinên de be, pîvan divê bercewendîyên gel be. Eger ev bibe dê ragihandina Kurdî bi erka xwe rabe.

-Tu dikarî PENa kurd ji xwîneran re bide nasîn, kar û xebatên we di hundirê vê sazîyê de, û aniha çi proje li ber destên we hene?

PENa Kurd di sala 1988an de li Kolnê ava bûye. Heta 2013an jî navenda wê li Almanyayê bû. Bi kongreya xwe ya di 2013an de biryar hate girtin ku êdî navenda wê li Amedê be. Li dinyayê 144 navend heye û PENa Kurd yek ji wan e. Çar komîteyên PENê heye; komîteya ziman û werger, komîteya nivîskarên zindanê, komîteya jinê û komîteya aşîtiyê...


Heta ji me hatiye me nûnertîya Kurdî û Kurdan di asta navneteweyî de kiriye. Her sal kongreyek giştî li welatekî dinyayê dibe û em beşdarî vê kongreyê dibin. Di nav birêvebirîya PENa Kurd de ji her çar parçeyê welêt hene. Ev PENa Kurd



hinekî ji sazî û rêxistinên Kurdan ên din cuda dike û ji hemû nerînên siyasî hene. Bi vê yekê em hêvî dikin PENa Kurd bibe modêlek ji bo hemû rêxistinên Kurdan. Endamên me ji welat, Ewropa, Amerîka, Kafkasya û li cihê din hene.

-Helbest boyî te çi ye, û ti berhemên te yê nû ku bîne çapkirin hene?

Di filîmekî de di şerê bidestxistina Qudusê de fermandarê artêşa Xiristiyanan ji Selahad-



dinê Eyyubî dipirse: Çi ye ew tiştê ku Qudus ji bo te ew qas pîroz dike û ji bo wê ew qas kes tên kuştin? Selahaddîn bi bişîrînekê pêşî dibêje: Qudus ji bo min ne tiştê e, piçekî dimeşe û dizîvire, dibêje: Qudus ji bo min her tişt e.

Mesele hinekî ev e bawer im, ji bo min jî helbest ne tiştê e û her tişt e jî. Hinekî mesele hestên meriv in. Dem û hest pirr girîng e bo helbestê.

Dosyaya min a sêyemîn heye, lê zû ye bo weşanê, min nedaye tu weşanxaneyan û demekê din jî naxwazim. Helbestên bo listikên şanoyê yê Mem û Zîn û Hamlet jî min nivîsandibû, ji bo çapkirina wan jî demêkê fikirîm derxim lê ji dile ji min nehat. Aniha wekî din tu berhemek din li

ber destê min tune.

-Gotina dawî, çi di dilê te de ma û te negot?

Gotinek pirr kilaşîk e ema em Kurd di qonaxê ecêb re derbas dibin, bi rastî beşek ji dinyayê wisa ye lê çerxa felekê aniha hinekî li dora Kurdan diçe û tê. Em ê çi qas karibin vê demê ji bo bercewendîyên gele xwe bikar bînin, tiştê girîng ev e.

Hêvî dikim her kes di beşa xwe de karê xwe baş bike û em hêjayî vî gelî û vî zimanî bin.

Spas bo ku we jî...

WÊJE Û SÎNEMA...DESTPÊK Û DAWÎYA DÎLANÊ

Nivîskar: Hişam Eslan

Ji zimanê Erebî: Hozan İsmâîl Hemê

Tev li ku têkiliya wêje bi sînemayê re tekûzkirî xuya dike, lê hin romannivîsan –ew bi xwe– ji bikaranîna sînemayê ji romanên wan re, qayil bûn, li gorî gotina Gabriel Marquez û her wisa Necîb Mehîfûz ê ku xwe mîna her tiştî di kar didît, nola romannivîsekî ku bûyer û kesayetiyên romanên xwe weke ku wî dixwest bi rê dixist. “Lê sînema karê grûpan e, tu kes bi tena xwe nikare biryaran bistîne”.

1- Marquez û Korasawa û Hîroşîma:

Hin serjimarên fermî –di destpêka salên 90î de– dan xuyan ku hejmara kuştîyên Hîroşîma û Nagazakîyê gihaşte 230 hezar kuştîyî, di heman demê de, hin nerîn amaje dikirin ku hejmara neragihandkirî bêhtirî niv milyon kesî ye.

Di heman maweyê de, ango piştî nêzî 50î salî ji teqandina her du bombeyên Emrîkî, 2700 kes dihatin dermankirin ji bandora bombeya atomî, “Dêmekî hîn jî tu Jabonîyan dikuji” derhênerê Jabonî Akîra Korasawa vê gotinê dibêje û dipirse: “Gelo çima ev bûyer li bajareke ku sîvîl tenê lê dijîn çêbû?”.

Karasawa ne di hevpeyvîneke rojnamergerî ya normal de diaxivî, lê dema ku li ser yek ji nûtirîn filmên xwe “Rabsodya Fî Augustus/Rhapsody in August” dixebitî, Gabriel Marquez pêrgî wî bû û hingê hevdihtinek pê re çêkir û “Los Angeles Timesê” di 1991ê de ew weşand.

Çîroka film li ser pîrekê ku ji teqînê flitiye, her wiha li ser têkiliyên wê bi nevîyên wê re. Mebesta wî –li gorî gotina wî– ew bû ku wêneyeke dirust ji birînên ku bandora çekên atomî di dilê gel de

hiştibû bîne ziman, her wiha bê çawa ev birîn hatin dermankirin. Di nerîna wî de, zortirîn tiştê di mijarê de ew bû ku Jabonîyan mijar paşliguh xistin. Sîyasetmedar jî, ji tirsê Emerîkîyan re bêdeng man, dibe ku ravekirina Harry Truman bawer kirin dema got: Teqandina bombeyê ji boyî bilezkirina bidawîhatina şer bû”.

Marquez dibêje ku bawerîyên wî yên kesayetî bi mirovatîyê ve ji filmên Karasawa wergirtiye, û ketiye bin bandora nerînên wî, ne tenê ji aliyê sitemkarîya Amerîkî ve ku bombeyên atomî li dijî sivîlan bikar anî, lêbelê ji aliyê plangerîya deshîlata Jabonî bi ya Amerîkî re jî da ku bihêlin ev bûyer di nav gelê Jabonyayê de bê jibîrkirin, lê nerîna wî ji ya Korasawa cuda bû çî ku wî nîfir li wîzeyê atomî dikir bêyî ku wîze di çalakîyên ne leşkeran de bikar bîn. Karosawa wisa bersivê dide: “Dê meriv bêhtir xwe nas bikin dema têbighêjin ku warine din di jîyanê de hene nayên kontrolkirin. Ez bawer nakim ku ji mafê me ye em zarokine bê kemax bînin dunyayê, an jî hespine bi heyst lîngan, weke ku aniha li Tîşîrnopîlê çêdibe”. Berî ku hay jê hebe ev gotûpêj pirr jidil bûye “Ji destpêkê ve ev ne di bala min de bû”.

Ev hevaxavtin di navbera her du hunermendên mezin de, der barê diyaloga hermayî li ser têkilîya wêjeyê bi sînemayê re bû.

Li gorî Marquez hindek romannivîs ji bikaranîna sînemayê ji romanên wan re qayil bûn. Derhênerê Jabonî vê yekê vedigerîne du xalan: A yekem, hin derhêner ne hişyar bûn bê çî qasî zehmet e ku wêneya wêjeyî di rêya sînemayê re bête wergerandin. A duyem, ew e ku heger ê derhêner tişteki lê zêde bike, li gorî yê romannivîs, sedemeke ku beşek baş ji romana wî di dîmenan de cihê xwe nebîne. “Carinan dibe ku mebest ji nivîsandinê tişteke be lê nikarîbû bi şeweyekî dirust bîne ziman”.

Hevpeyvîn di kovara (Elfilm) de ku sernivîskarê wê nivîskarê Mesrî Samih Samî bû, di hejmara xwe ya dawî de hate weşandin, û Mihemed Tariq ew ji “Los Angeles Timesê” wergerandibû zimanê Erebi.

Desteya nivîskarîyê hejmareke tayebet bo têkilîya di navbera her

du navgiran de (wêje û sînema) terxan kir. Navçeyên wê di bin sernavan de hatin jimartin; hin ji wan: “Jêwergirtin di sînemayê de... gerîna li bûhayê û veguhastina nûjenîyê” yên Welîd Elxeşab. “Pesindayîn di navbera wêje û sînemayê de” ya Selma Mûbarek, “Jînenîgarî di navbera wêje û sînemayê de” ya Dalîya Elsûceynî. “Peyiv û Kamera...derbîrîna kîjanî xurttir e?” ya Nermîn Yisir. “Vebêjtin û Sînema” ya Eşref Elsebax, û warine din jî.

2- Bêşûda Narvînan:


Necîb Mehîfûz li ber destê derhênerê Mesrî yê navdar Selah Ebû Sêf fêrî nivîsandina senaryoyê bû, jixwe Ebû Sêf ji bilî romana “Ebes Eleqdar/Bêşûda Narvînan” sala 1974an, a Mehîfûz nexwendibû. Gellek caran Ebû Sêf û Mehîfûz bi hev re rûniştin, Ebû Sêf hûrbînî û teknîkên nivîsandina senaryoyê jê re dan xuyan, her wiha komek pirtûkên girêdayî bi vê hunerê dane wî, Mehîfûz ew bi kelecânî xwendin. Mehîfûz dibêje: “Ebû Sêf filmek li ser Enter û Ebla amade dikir, min dest bi nivîsandina senaryoyê kir û daxwza wî encam da, encam jê re (di nerîna Ebû Sêf de) pirr balkêş bû. Hingê min 100 cinêh (pereyên Mesrî) wergirt, ev yek dergeheke nû di jîyanan min de bû, nola derxistina petrolê di Kendava Erebi de”.

Mehîfûz ji karê xwe yê nû piçekî aciz bû, çî ku di romannivîsîyê de, wî xwe weke her tiştî di kar de didît, bûyer û kesayetên romana xwe li gorî nerîna xwe ya taybet bi rê ve dibir. “Lê sînema karê gropekê ye, tu nikarî bi tena serê xwe biryardar bî”. Îcar xweşbûna destkeftiyên diravî hişt ku van mijaran tevdan paşliguh bike, li gorî hevpeyvîna wî ya berfireh bi Recaa Elneqas re, ku li jêr navê “Sefehat Min Muzekkerat Necîb Mehîfûz/Rûpeline Ji Bîranînên Necîb Mehîfûz” hate weşandin. Pirtûkek fena jîyannameya “Elherafîş” e. Hevpeyvîn ne bi dariştineke kilasîk hat nivîsîn, lê ew bi şeweyê axivîner hatiye nivîsîn.

Di vî beşî de, têkiliya wî bi sînemayê re, ne tenê li ser karê xwe wekû senaryonivîs an jî tev li ku pîspor bû di vî warî de, axivî; tu carî senaryoyê filmekî ku çîroka wî ji romanên wî ne nenivîsandîye. Her wiha li ser nerîna xwe der barê çavdêriyê de ku wezîrê çandê

hingê Serwet Ekaş karê serokatîya wê spart wî, axivî: “Danûstendinên min bi berhemgeran re hatine birrîn, û min nema tu çîrokên xwe firotin wan, qena derîyê xatiran bigirim, lê pejiwandina min ku bibim Birêvebirê Giştî yê Çavdêriyê pirsnişanek li ser rûyê heval û xwîneran nîgar kir. Gelo ezê çawa azadîxwaz bim û paşê razî bim ku çavdêrek li ser hunerê bim û sînoran ji azadîya hunermendan re çêkim?”.

Çavdêrî wekû têgihaştina Mehfûz ne hunerî ye, û dûrî hunerê û nîrxê wê ye, lê erkê wê ew e ku parastina siyaseta dewletê ya bilind bike, her wiha birrîna rêyên arîşeyên olî ku bibin sedema pîrsgirêkekê, û parastina nîrx û nerê û tîtalên civakî li gorî rewşa heyî. “Ji bilî wisa ji mafê hunermend e ku nerîn û bocûnên xwe bi şeweyê bixawze bêne ziman”, danerê “Zarokên Taxa Me” wisa dibêje!



3-Axiftineke din Carekê derhênerekî mezin ji hevalê xwe yê romannivîs re got: Heger tu romaneke orte bikî filmek sînemayê ev karekî pîr hêsan e, lêbelê hevrikîya rasteqîne ew e ku romaneke gewre bibe filmek sînemayê yî xweş. Mebesta wî ew bû ku karê veguhastina wêneyê ji romanê bo televîzyonê wê qet ne serkeftî be, ji ber bûyera di romanê de wê ne heman bûyer be di kamerayê de. Lê mercgirî ew e ku tiştên di romanê de nehatibin naskirin bêne diyarkirin, mîna hewildanekê bo ku li bersiva pirsên di romanê de bigere, yan bi kêmanî, pirsan ji hev din derxin, ne veguhastina heman deqê bo navbîjîvanekî din re. Derhêner: Dema ku em nivîsandinekê ku dikare dûrahîya dîtbarî bi rengêkî baş pêk bîne, dibînin. Em dibêjin: Ev e Sînema.

Romannivîs: Dema ku em li filmine xweş temaşe dikin, em dibêjin: Ev e Roman.

ANTOLOJÎYA WÊJEYA JAPONÎ YA NÛJEN

(Ev antolojîya ji hêla Columbia University Pressê ve hatiye amadekirin)

Edîtor: J. Thomas Rimer and Van C. Gessel

Ji zimanê Ingilîzî: Ziwan Hemo

Di vê antolojîyaya berfireh de karên xeyalî û helbest û drama hene, û ev nivîs bi xwe gotarek bû ku demekê girîng di dîroka Japonyayê de destnîşan dike. Her wisa serkeftinên wan ên wêjeyî jî.

Nivîsên vê antolojîyayê guhertinên siyasî û civakî û ramanî yên ku –di vê demê de– di civaka Japonî de qewimîn dide xuyanîkirin, her wisa raman û wêjeya Rojavayî jî tîne ziman, li alîyekî din jî geşbûna neteweyî û karêgerîya aloz di navbera hêzên kevin û yên nûjen de dîyar dike.

Gellek caran wergerên nûjen ji nivîsên kialsîk belav dike, ji alîyê van nivîskarên navdar ve wek: Nagai Kafu, Shimazaki Toson, Natsume Soseki, Kawabata Yasunari û Yosano Akiko. Sernivîskaran berhemên jinine nivîskar ên nenavdar nas kirin, berhemên gellek ji wan jî bi zimanê Ingilîzî peyda nedibûn.

Li gorî rêza demikî û ji alîyê celebê ve –wekû pergal- û pirrbûna bûyerên sereke destnîşana pêşketinên wêjeya Japonî ya nûjen dike: Wêjeya kilasîk a Japonî bi xwe, nola helbesta Çînî, li himber çand û wêjeya Rojavayî derket.

Nivîskarên Japonî yên nûjen ji nû ve wêjeya kilasîkî ya Japonî dariştin, bi vê yekê zimanê hemdem çesipandin, û bêhtir bal kişan-

din ser hêmanên derûnî. Û têgi-
hên bedewtîyê yên kevin li gorî
zihnîyeta sedsala bîstan şirove
kirin. Dema ku ramanên nûjen
bandor li xeyalê hin nivîskarên
Japonî kir, fena helbesta kilasîk a
Çînî ya ku ji bo kesine din girîng
ma, nivîskarên MEIJI berdewam
bûn di nivîsandina helbesta hev-
girtî di kilasîkiyatên Japonî de. Û
pabend bûn bi sîstem û ramanên
konfoşosîzimê. Sedemek din jî
heye di avabûna wêjeya Japonî ya
nûjen de ew bû ku bûbû mîna-
kek ji nivîsên Rojavayî re, yên ku
sirûşa wêjeya nû destnîşan dike û
derfetan ji xwîner û nivîskarên
Japonyayê re pêşkêş dike.

Ev antolojîya ji çar beşan pêk tê, bi nivîsên nûjen -ji despêka 1870yî
ve- dest pêk dike, û bi berhemên nivîskî di dema salên
guhertina civakî û ya berî şerê cîhanê yê yekem de, û nivîsandina
ku di dema navbera her du şeran de hate naskirin, berdewam e;
serencam jî ew bû


peydabûna deqên ji şerê cîhanê yê duyem.

Di hindek beşan de pêşgotinek têrwate û bisûd peyda dibe, û
nivîsan di nav çarçoveya wêjeya siyasî û nivîsên çandî de diçivîne.
li gel jîyannameyên hindek nivîskaran jî.

Der barê nivîskar de:

J.Tomas Rimer professorek, di ziman û wêjeyên Rojhilatî Asyayê,
di Zanîngeha PITTSBURGHê de ye. Gellek berhemên wî hene, jê:
(Tîtal di xeyala Japonî ya nûjen de) û (Pêşgotin û rêbera xwînerên
wêjeya Japonî).

C. Van Gessel professorê wêjeya Japonî di Zanîngeha BRIGHAM
YOUNGê de. ew yek ji sê romannivîsên nûjen e: Soseki, Tanizaki,
Kawabata û Coeditor ji zanyarên Showayê.



BERF**Dema Japonyaya Spî Kirasê Romansa Fransayê Li Bejna
Xwe Dialîne****|Ebas Mûsa**

Romana BERFê ya romannivîsê Fransîz Maxence Fermine, romaneke wisa ye ku dikare xwe bi nazikî berde hûrgilîyên jîyana Welatê Berfê -Japonyayê- û taybetmendî, hestiyarî û razeke wê ya mîna helbesta haikûyê bi hemû xwîneran re bi par ve bike.

Pêwîstîya romaneke ku raza berfê û helbestên haikûyê vedibêje, bi zimanekî nazik heye, îcar ku ew der barê welatekî dûredest ê mîna Japonyayê de be, pêwîstîya wî zimanê nazenîn girîngtir dibe. Gelo romannivîs xwe daye ber çî azmûnê heta nivîs qedandîye; tu dibêjî qey sonda giran xwariye ku romaneke wisa nazik mîna helbesteke haikûyê, spî mîna gulîyên berfê, bilind mîna Çiyayên Alpê û bedew mîna Neige\B erfê binivîse.

Şêweyê romanê bi xwe di formeke nû de hatiye raberkirin ku ne tenê bûyer tê re derbas dibin, lêbelê helbest mîna pirîskên berfê jê dibarin. Her weha roman fena haikûyê kurt û têrwate ye, ev jî nîşana wê armancê ye ku dixawze şêwe bi xwe jî wekî haikûyê xuyanî bike.

Jîyana Rastîn a Helbesteke Haikûyê:

Bêguman kesê romana BERFê bixwîne dê tê bibîne çawa helbestbêjî piştî pexşana romannivîsîyê dişikîne, çî ku hest û bûyer bi heman hostatîyê têne ristin, helbet çîroka romanê hêmaneke balkêş e, lê hêmana balkêştir ew bihevgerêdana di navbera parçeyên çîrokê bi xwe de ye.

Yûkoyê ciwan naxwaze bibe şervan, dixwaze bibe helbestbêj; ne helbestbêjê her tiştî lê yê berfê bi tenê. Kur vê biryarê dide û paşê biryara xwe ji bavê xwe yê koçek re eşkere dike. Ji bo vê yekê jî ber bi berfê ve diçe û dinivîse. Di wan rojên berfin de helbestên xwe yên herî spehî û spî dinivîse. Rojekê ji rojan helbestbêjê eywana şahîşah li gel jineke bedew tê serdana Yûko. Kêfxweşiya xwe bi helbestên wî pirr tîne, di serdana duduyan de helbestbêjê eywanê dibêje Yûko ku hunera rengan ji haikûyên wî kêr e, ji lew re jê dixwaze ku li ber destê mamosta Sûzokî hînî hunera rengan bibe.

Di rêya xwe ya ber bi hînbûna rengan ve de, Yûko Nige\Bêrfê li ser darbesteke qeşayê dibîne, Yûko dil berdide Nige\Bêrfê û wekî helbesteke berfin a haikûyê tê ber çavên wî, şevêk nîv xewn nîv rastî diqedîne, paşê ber bi rêya xwe ve diçe. Dema dighêje ba mamostayê rengan ê kor, mamostayê gewre Sozokî, mamosta wî hîn dike bê çawa reng ji hundirê meriv dertên. Di nava sihetên mamosta û şagird de, Yûko tê derdixe ku ew darbesta qeşayê ya jina bedew, darbesta Nigeyê, hevjin a mamostayê wî ye.

Nige, pehlewana Fransîz a mîna pirtikeke bêrfê, ji bilindahîya hezar pîyê li navbera her du çîyayên Alpê hatiye xwarê.

A rast ew e ku romana BERFê dixwaze bûyerinan bide pêş ku di navbera rastî û hestên helbestbêjekî de bin. Ma girêdana bûyeran ji pêşî û heta bi dawîyê ne ristên helbestbêjekî ne? Lê di heman gavê de hostatîya romannivîsekî ne ku dixwaze gotarekê bibêje, hem bedewîyê hem têkilîya di navbera Japoniya û Ewropayê de; rengê têkildariyê jî berf be. Her bihele jî dê tişteki di şûn de bihêle, dibe ku bedewîyeke bêdawî be, dibe ku rengereng be û dibe ku keskesor li esmanê helbesteke Haikûyê be.

Roman gellek peyaman di nava xwe de hildigire, yek ji wan ku dibêje: Spîti windabûn e û pêdivî bi rengan hemûyan heye da ku berz û xuya be.

Nige û Yûko û Jîyana Japonyayî Li Qeraxa Ewropayê:


Rojhilat û Rojava di BERFê de dighêjin hev. Jixwe roman dixwaze gotara têkilîya di navbera her du çemperan de vebêje, dîmena Neigeya pehlewan zehmetîya têkilîyan di navbera Rojhilat û Rojavayê de dinimîne ku jixwe ew werîs di navbera du çandên cuda û cihêreng de hatiye vedan, loma zor û zehmetî

qehremana bedew a romanê dide erdê û wê binberf dike.

Fermine dixwaze bihevgerêdana şarwerîyê di rêya bedewîyê re bide der. Her çendî azmûna romannivîs zehmet be jî ku roman di navbera helbest, bûyer û

jîyana welatekî wisa dûr û dûredest ê mîna Japonyayê de digere, dema Yûko biryarê dide ku nebe şervan dîsa gotara romanê ji me re dibêje ku bedewî jî dergehekî bipêşveçûn û avakirina welêt e.

BERF Bi Kurdî Dibare:



Pirtûkxaneya Kurdî bi wergera wêjeya cîhanî nehatiye dew-lemendkirin, çi ku tevgerêke fedîyok di vî warî de heye, lê çi qas ew tevger hindik be jî em dikarin bibêjin ku gavên pêşîn bi pirtûkên giranbiha û hêja dest pê dikin. Bi wergera romana BERFê re em du tiştan bi dest dixin, hem em nivîseke Fransizî bi dest dixin, hem jî romaneke ku der barê Japonyayê de hatiye nivîsîn. Jixwe wergêr Îbrahîm Xelîl karîbû vê romana nazik û helbestî bi Kurdîyeke resen û nazik raberî me bike. Dersên vê romanê ne tenê haikû, pehlewani û berf bûn lê hemû bi hev re bi zimanê Kurdî bûn.

BERF, roman, Maxence Fermine, wergera ji Fransizîyê: Îbrahîm Xelîl, Projeya HINARê ya Çandî, Qamişlo, çapa yekem, 2016.

BERGÊN PIRTÛKAN Û HEZKIRIN

|Xalid Sulêman Elnasirî
|Ji zimanê Erebî: Xoşman Qado



Wêne: Wênegirê Itali
Marco Garofalo

Çaxa ku kesek ji me diçe pirtûkxaneyê û dest bi lêgerîna xwe dike, ew berê dizane çî pirtûkê û li ser çî mijarê ye, ji xwe re bikire. Navnîşanîne bi dawî nabin. Reng û şeweyîne cihêreng ji refik û maseyên nîşandanê berbiçav in, navnîşanên wan bang te dikin. Mijarên sîyasî û wêjeyî û zanistî, dengên şeran û zingezinga dîrokê, girîyê gelinan û kenên gelîne dîtir, nexşeyîne cihên xwe diguherin û serîyîne têne serjêkirin û bêhna xwarinê. Her kêliyêkê jî dengê helbestvanekî –ku helbestên xwe dixwîne- ji cihekî ku bi şaşîti em di ber re derbas bûn tê. Û ji odeyêke din dengê kenê zarokan tê. Belkî me mûzîk nebihîst lê dengêk nizim ji felsefeyê ji bin maseyan dihat; me pirtûka xwe nedît.

Di qerebalixek ji vî rengî de normal e ku bîrewerî pûç be; îcar tu nîşana pirtûka xwe ji bîr dikî; weşanger, sala weşandinê, ... çare çî ye?! Ez aniha li pirtûkxaneyê me û min xwesteka xwe nedît, ma gelo ez dest vala vegerim! Helbet na. De ka ez pirtûkeke din –bi kêmanî- ji xwe re bikirim.

Dîsa em digerin. Aniha jî pîrsgirêk mezintir bû ji ber ku em dê li pirtûkek nenas bigerin, berê xwe bidin nivîskarîne navdar, û belkî weşanxaneyîne navdar û naskirî, lê tiştek nakeve bîra me de. Kêmcîr navê pirtûkan dibe sedema kirrîna wan, nemaze bi hebûna hejmareke pîr ji pirtûkan, û li pêşîya qerebalixa wekyek û dûbarekirinê. Vêca heger ê weşanger navê pirtûkekê

berbiçav bidestbixîne hingê dikare wê li ser kîsên çementoyê çap bike, û dê di firotinê de serkeftî be. Serê pengê li ber me winda bû, û tenê divabû em tiştên ku jê hez dikin di pirtûka ku dixawzin bikirin, bînin bîra xwe! Ji lew re dê mekanîzmeke nû çêbibe, û dê gellek hêman û sazgêrîyên aloz karêger bibin da ku bihlê dawîya dawî em biryara kîrîn an nekîrîna pirtûkekê bidin.

Li gorî helbestvan û romannivîsê Îtalî yê navdar Cesare Pavese “Bandora bergê pirtûkê li ser pirranîya xwîneran ji gotareke rexneyî bêhtir e, çî ku karekî hunerî û veşartî di ronahîya pirtûkê de pêk tîne”. Bi rastî bandora bergên pirtûkan li ser meriv heye da ku em bizanibin ew danerê em dixwazin jê re bixwînin divê çawa be. Ew tişteki nehistyarî ye mîna nerîna yekemîn e:

Ez bi tena xwe me û dixwazim bi dergistî bim, ka em vê bikin navnîşan an mijara pirtûka ku em lê digerin. Em biçin şahîyeke mezin ku gellek hatine vexwendin, û li nav wan bigerin, û ji nişka ve xortekî yan keçekê cara yekê bibînin, di demeke kurt de, em dê biryara xwestina wê/ wî bidin. Heman tişt li pirtûkxaneyê çêdibe çaxa ku em bergê pirtûkekê dibînin: Navnîşaneke giştî wekî navnîşana me ye, lê tişteke taybet heye di hêla ku em biryarê bidin û nêzî wê keçê yan wî xortî bibin û bi hev re biaxivin, û dê ev mijar an biser bikeve yan jî na. Dibe em nas bikin ku yê din bi dergistî ye yan belkî axavtina wî/ wê nekeve serê me de. Lê di pirtûkxaneyê de yê ku bibinketina têkilîya di navbera pirtûkê û yê xwîner de dibirre ew e gotina ku li ser bergê tê nivîsandin, çî ku hêmanek sereke ye ji hêmanên bergê.

Rola dîzayînê ew e balkişandina xwîner e da ku xwesteka kîrîna pirtûkê li cem çêbike, û rola gotina ku li ser bergê tê nivîsandin ew e ku bi hêla yê xwîner pirtûkê bikirre yan na. Ji lew re dîzayîn roleke mezin di firotina pirtûkan de dilîze. Û em ji bîr nekin çaxa ku dîzaynkirina bergan di dîroka nûjen

de dest pê kir rêjeya xwîneran jî pirrtir bû, jixwe nimûneyên bergan ên ku bûn sedem bo bilindkirina sata firotna pirtûkan bi dawî nabin.

Cudahî di vê mijarê de ew e ku nehişyarîya meriv di mijarên hezkirinê de berfireh e û nayê çarçovekirin. Lê nehişyarîya wî di mijara pirtûkan de têye destnîşankirin, û ev destnîşankirin bi xwe ciyewazîya kesê psopor di warê dîzayînê de ye da ku derfetê bide wî bo afirandina dîzayînekê da ku bikaribe cihê xwe di nehişyarîyê ya pirranîya xwîneran de bigre.

Wêne

|Çîmen Adil

Wêneya te...

Bi qasî ku wêneya te ya biciwanî dilê min xweş dike...

Wilo û bêhtir jî wî xemgîn dike

Rûdêmên te, xortanîya te.

Niha piştî çend salan, qermîçok û xûzbûna pişta te ya fedîoook

Agir berdide hinavê min,

Erê wêne kêlikan weke dûmenekê ji bîranîn diparêze

Lêêê her ku li wêneya te ya bi ciwanî dinerim

Kela girî di zengelora min de asê dimîne,

Tev li wilo jî wêneya te her dem di tûrê min ê gerok de ye....

Her çend rojan bi hêsirên kêf û xemgînîyê lê dinerim

Û hîn jî dilê min tiiiiiiiiiiiiiiiiiii dimîne.

Wêne gerimbûna himbêza te

Dilovanîya destê te

Dixapîne Yabooooooooo.

Himbêza te

Min bipêçe di himbêza xwe de
Nivînên dayîka min tevî hîrya wan a geş min gerim nakin
Û ez ê çavên xwe bigrim da ku tevî gotinên te werin alandin
Lê tayekî ji wan nekşîne
Da ku xewnên min nerijn û pêjna te belav belav bibe,
Di wê kêlîkê de mirin bi min şîrîn dibe
Guneh û şaşîtîyên merivan bi çav dibin
Ta xwedê jî nema ez wî gunehkar dibînim,
Û her ku himbêza te merdtir dibe
Ez demûştir dibim.

VALA NEBÛM

|Hekîm Ehmed

Biryara min ku tu bê,
Biryara te ku li bende te bimînîm.
Duh, xwîna min kelî,
Li bende te mam, du pakêt çixare,
Du bêjeyên gunehkar,
Û gellek.. gellek serêşî.
Berî çixareya bîstan,
Min xwest ku kevir bibarin,
Zemîna kulperest biqîre,
Û mîna bermîlekê biteqe.
Dixwazim ez razim,
Ranezam,
Ji tîrsa ku şîyar bibim li ser...
(Dixwazim ez razim).

* * *

Tîştê ku ez qeherandim,
(dinya),
Li hev gelicî,
Mîna poreke ku ji berî heftsed salan ve,
Şeh nebûye.

* * *

Tîştê ku ez dîn kirim,
(miletê),
Ji pişt û zimanekî,
Û afirandina mayî bi dawî nebûye,

Ji ber hişmendîyeke nenas
Ku hîna şîrove nebûye.

* * *

Tiştê ku ez dikuştîm,
(Xewn),
Bi mezinbûna pizrûkeke xunavê,
Lê çi qas evîndar tê de fetisîn!!

* * *

Tiştê ku ez winda kirim,
(Xwedêyo ez),
Berî roja vejînê gotin,
Û xwe pê neman kirin.

* * *

Ev e (tirs),
Hosteyê meşa bi dizî,
Û serokê me yê dêw e.

* * *

Tu hîna nehatîye,
Kevir nebarîyan,
Û zemîn neteqîya.
Ev şev ez im,
Ez im îşev,
Li vir û wir,
Niha û sibe.
Li bende ku tu neyê,
Min bang li te kir:
Bibore,
Vale nebûm ku bêrîya te bikim.

PENABERÎYA BÊDAWÎ

IBuşra Hamid

Lehîya baranê û reqereqa ewran, golên avê li nava bajêr, dîmenên çend rojan bûn, êdî hêdî hêdî seqa xweş dibû û xelkên bajêr mîna mûrîyan liv û tevger dikirin, nexasim cejin jî nêzîk dibû.

Li bajarê mezin, bazareke mezin heye, cejin nêzîk e û dengê bazirganan bi ser bajêr ketiye, ji bilî xwedîyê dikanekê biçûk navê wî jî Azad e, di nav wê qerebalixê de, dike û nake deng ji zengelora wî dernakeve, Azad bi xemgînîyeke mezin di dikana xwe de rûnişt û bi êş û janeke kûr diramîya bê çawa ji berbangê ve şîyar e, û ta aniha firtoin nekiriye, tebatî bi canê wî nakeve carekê radibe û careke din rûdine û ji şeva bihûrî ve xwarin bi devê wî neketiye.

Azad şaşîk li serî pêça, destê xwe xistin bêrîka xwe, çixareyek derxist û vêxist, sarmayek di damarên wî de gerîya, ji bo ku xwe gerim bike, mîna dilekî di goşeya dikanê de rûnişt û xwe da hev.

“Ez ê çi ji hevjinê xwe re bibêjim? Zarokên min ên li bende cilên cejinê yên nû, ez ê çi dereweke nû li wan bikim? Dê çawa wan bidim famkirin ku tiştek bi min re nehate firotin?

Ev pirs bi tevahî di ramanên Azad de bê bersiv man.

Careke din li xwe vegerîya û got:” Mîna her carê, ez ê ji wan re bejim ku min ji bîr kirine û ezê sibe ji we re bînim.

Ji van sawêran, Azad şîyar bû û vegerîya li ber devê dikana xwe rûnişt û bi dengekî kelogirî bang li xelkê kir da werin û cila

bikrrin

Dinya şevreş bû, û xwedîyên bazaran berê xwe dane malên xwe, Azad jî tevî wan bû û ber bi malê de çû, di wan kolanên tarî de, zaroktiya wî mîna zincîrekê li ber çavên wî derbas bû. Ji qermîçokên ku di rûyê wî de hatine nexşandin, meriv hest dike ku mêrekî 60 salî ye, lê bi xwe nivê vî temenî kiriye, gellek bîranînên zaroktiyê hatin bîra wî, dema ku li gundê xwe şagirtê dibistanê bû, dema daîyka wî şîret lê dîkir ku bi xwendinê dê siberojeke xweş ava bike, di hate ber çavê wî dema ku bi hevalên xwe re pirtûk dixwend, Azad derbasî zanîngehê bû û bi serkeftin xwendin bi dawî kir, lê qet nizanîbû ku dergehên jîyanê li pêşîya wî dê bêne girtin.

Pîştî meşke dirêj, Azad gihaşte nêzî mala xwe, ew mala ku dikeve taxeke tarî û bêdeng, ji ber ku pîştî kirîzê pirranîya xelkên taxê koçber bûn, bi tenê Azad û çend malbatên din li wir mane.

Hayê Azad ji wî tunebû ku bi dengê bilind bi xwe re diaxive û dibêje: Xwezî ez vegerim zarokek di himbêza daîyka xwe de bê kul û bê xem, xwezî min hêvîyek ji wan hêvîyên zarokên xwe bi cih anîba, lê dara xwezîyan tu carî şîn nabe.

Bi laşekî westîyayî, gihaşte ber dergehê malê, ji nişka ve, çavên wî tarî bûn û nema tiştek li dora xwe dît, bayeke gerim li nav rûdêmên wî ket, wî neçar kir ku çavên xwe veke, di wê keliyê de li dora xwe nerî û dît ku deryayek ji konên spî li dora wî ne, wê çaxê Azad nas kir ku jîyanekê bi êş û penaberî li bende vê malbata perîşan e.

ÇAVÊN VEMIRÎ

I Arya Hacî

Dema ku çavên meriv vekirî bin, û roj tevde şeva tarî be, êdî ne mal ne jî mewda bi tevahî ji vî merivî re wateyekê didin jîyanê.

Wiha rojên Nazê bi rengê reş derbas dibin, her roj mîna ya berî wê, bê kêf û bê wate diçin, dibe ku carcaran dengê zarokên wê di nav talbûna jîyanê de, çêjatîyeke şîrîn be, lê ew jî, ne her kêlî jibo wê peyda dibe.

Tev li ku narvîna giran a li dijî Nazê rabû û her du çavên wê jê stend, zarokên wê, hêvîya jîyana wê jî bi narvînê re heval bûn, û tilîyên xwe ji nav tilîyên daîyka şîrîn derxistin û dûr çûn.

Nazê bi tenê, bê çav, bê hêvî, mîna gemîyeke şikestî di nav pêlên tarîtiyê de difetisî, bê çare bû, lê dema ku meriv xwedî xwişk be tu carî bi tenê namîne, êdî dinya bi çavên xwişka xwe didît.

Xwişka wê lê xwedî derket, hewil da ku Nazê ji nav bêhêvîtiyê bikşîne, êdî Nazê ji xwişka xwe re bû mîna zarokeke nûxwedê-dayî, xwarinê bi destê wê dixwe, avê bi destên wê vedixwe, cilên wê diguhêre û demekê dirêj li civata wê rûdine, û li ser jîyana li derdora wê ji bo wê diaxive, mîna ku ev xwişk ji Nazê re bûbû du çavên nû.

Her cara ku dengê telefonê tê, Nazê bi eşq li dora xwe dizivire, bi hêvîya ku hin ji zarokên wê bin, wiha ye ku dilê wan li ser daîyka wan be û daxwazê jê bikin ku bi wan re bijî, û gava bi rastî zarokên wê li ser xeta telefonê bin, bi tenê çend xulekan diaxivin û xatirên zuha ji vê daîyka bêbext dixwazin, careke

din dengê wan ji Nazê re dibe kelem û mîna ku xwê li ser birîna wê de bête rijandin û ji nû ve ev birîn vedibe, wiha dilê wê dişewite, û bi hestekî birîndar serê xwe li ser balîfa xwe datîne û di nav tarîtiyê de dikeve xewke giran.

Çendî meriv di canîya xwe de bi hêz be, çendî ku xwedî zarok be, û her ku mal û mewda hebin jî, lê dema narvîn zora meriv bibe û xurtir be, ronîya dinyayê di çavan de vemirîne, êdî ev meriv dibe nola dareke şikestî û roj bi roj di nav pêta jîyanê de dişewite.

Kewa Gozel

MÎRO

Herê: Serhed

Çevkanî: Dengbêj Şakiro

Mîro mîro mîro mîro mîro mîro mîro mîro
Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil
Lo rebîyo xwedê xirab bike dilê bê dil,
Fenanî gakî bê werisî bê cil
Fenanî kirasî qolî bê mil,
Fena dara bê şalûl û bilbil,
Fenanî xasbexçekî rût î bê gul
Bila dilê rezîl bi dil be,
Tûrê parsê li mil be,
Parsa meriv ne li vir be,
Nava dazdeh duvalê ecnebî,
Ûrisan li mala Emerîkanê gewir be
Parsa meriv birije,
Tûrê meriva yê qûl be,
Meriv li ber dîwarê evda be,
Meriv xwedî kerî nanê garis û cê di gilgil be
Ber seryê meriv kevir be,
Malxirabo ser rexa meriv gunî be,
Bin rexa meriv postê jûjî be,
Tek bila di dêrisê gundan de,
Dilê rezîl bi dil be ax dilo hey dil

Tu nizanî min digot qey tu mêr î,
Tu camêr î, min digot kotîyê mêran ne li mal e,
Tu şeva îşev bişkênî camê camekanê şûşe û pencereyan, zirza

derî

Şeva xwe di nava taxima sîng û
berê min esmerê de bibihorî

Min nizanîbû tu ne mêr î, ne
camêr î,

Tu ji miskînê heramê mêrê min
newerî

Tu nizanî ez ê ne azeb im, ne bi
mêr im

Ka melê gundan, de ez ê bi kaxit û
bi nivîşt im, bi seyr im

Tu dêhna xwe bidî vê sivengê ez
dikim herimê

Lawikê min bû girtîyê taşxana

Diyarbekir

Ez ê vê sivengê dikim herim

Dîtina xelkê xwe wey têtî delalê, şebabê, potê

Gelo vê sivengê , malxirabo ji tirsê heramê miskînê mêrê xwe
newêrim

Ez ê vê sivengê, malxirabo ber

tirba erebê reşê lêv deqandî,

Xîmê binê beriya tewr a jêr im

Hey dil hey dil hey dil ax hey dil hey dil dilo hey dil

